

Hevpeyvîn: Bi Hevjîna Dr. Qasimlo Re

Rehîm Reşîdî

Rojnamevanê hêja û xwedî şiyar, Rehîm Reşîdî ji bo min telefon kir û got ku rojnameya "Kurdistan"ê û duheftînameya Agirî dixwazin di yad û bîranîna 20'mîn salvegera terora Viyenê de hevpeyvînekê bi we re çê bikin...

Pirsyar ji bo min xwendin

û min jî daxwaz qebûl kir û bi vî awayî bersiva pirsan didim. Berî her tiştî dixwazim bibêjim ku "Kurdistan" û



Agirî di xebata rojnamevaniya kurdî û tekoşîna şoreşgerane de heya niha rolek çalak, ektîv û cihê hurmetê di Kurdistana Îranê de listine. Ez hêvî dikim bi kar û tekoşîna nivîskarên niha ku bi gotina Reşîdî piraniya wan ciwanên bi şiyar û keddar in, pitir geşe bike û her pêşde biçe. Berê jî min gotiye ku min bîranînên zaf tevî "Kurdistanê" de hene. Wê dema ku ez bi qaçaxî li Tehranê dijiyam, min di çap û belavkirina wê de hevkarîya Dr. Qasimlo dikir. Xwezî ji wan rojan ku rêya jiyana min bo hertimî bi kurd û xebata mafxwazane ya kurdan ve girê da û dê heta dawîn nefesa xwe jî her wefadar bi kurd û armancên kurdan bimînim. Ez bêguman im ku ev netewe dê ser bikeve. Pirs: 20 sal bi ser Şehîdkirina rêberê mezin yê gelê kurd derbas dibe û roj li pey rojê rêbaza Dr. Qasimlo xurtir dibe û evîndar, rêvîng û xebatkarên wê zêdetir li dora wê rêbazê kom dibin. Te weke hevsera wefadar ya Dr. Qasimlo, piştî borîna van 20 salane çi hestek heye? Gelo hûn li ser vê

beweriyê ne ku bîr û hizrên Dr. Qasimlo zêdetir ji serkevtinê nêzîk bûne?.

Nesrîn Qasimlo: Eva ku ew teror di civakek demokratîk de birêve çû û eva ku edalet û dadperwerî birêve neçû, ez 20 sal e ku hest bi nerehetî û nigeraniyê dikim, ji wan kesan nerihet im ku xwîna rêberên kurdan kirine goriyê qazanc û berjewendiyên aborî. Bîr û hizrên Dr. Qasimlo, mirovdostane û demokrasîxwazane bûn. Îro ne tenê Kurdistan, belkî gelên din yê Îranê û azadîxwazên wî welatî jî weke Dr. Qasimlo difikirin. Lewra serkevtin her ji bo wê rêbazê ye. Kurd ger bi başî ew mîratên ku Dr. Qasimlo ji wan re bicî hiştiye bînin cîh, serkevtin misoger e û tu zordarek nikare pêşiya serkevtina wan bigre. **Pirs:** Di 22'ê Pûşpera çend salên derbasbûyî de û bi taybet ji sala 1384'ê Rojî (2005) virdetir, civatên xelkê Kurdistanê hemû salekê yekdem û bi yekhelwest bi daxistina dukan û bazaran û temirandina çirayên malan û çend şeweyên din, yad û bîranîna Dr. Qasimlo bilind dinirxînin û cinayeta Komara Îslamî mehkûm û şermezar dikin. Bi raya we ew terze helwestane ku her sal berîntir û berfirehtir birêve diçin, heya çiqas bandor û karîgerî heye?

Nesrîn Qasimlo: Karîgerî û bandora van terze bizavane zaf e û ez keyfxweş im ku neteweya kurd rêbaza rêberên xwe wunda nekiriye û bi her awayekê ku ji wan re dilive, yad û bîranîna wan birêz û bilind dinirxînin. Eva jî baştirîn mînak e ku kurd şerxwaz û xwînrêj nebûye û nine. Xebatek serkevtî ger bi nirxek kêmtir jî ser bigre, pirr baştir e.

Di vê derheqê de ez pîrozbahiyê **D.R (11)**